


# Rêbernameyek kurt li ser vaksîneya vîrûs korona

Agahiyên kurt li ser vaksîneya KOVÎD-19 (vîrûs korona) ji enstîtuya tenduristiya giştiya Norwêcê.




## Li ser vaksîna vîrûsa korona

Vaksîn ji her kesê ku vaksîne jêre hatiye pêşniyar kirin, tê radest kirin.

Ev vaksîne belaş e.

Vaksîn li hember Kovîd-19 ve diparêze.




## Divê hûn çawa vaksîneyê bistînin?

Derziya vaksînê di milê kesekî de tê lêdayin.

Hinek ji van vaksîna bi du caran, paş navbera çend hefteyan tê lêdayin.

Eger hûn ducanî ne, we alerjiyên gengazî heye, hûn dermanî bikar dînin, an nexweşin, yan tûşî Kovîd-19 ê bûne, ragihînin.



## Ev vaksîn çiqas bi bandor e?

Piraniya mirovan 1-2 hefte piştî wergirtina vaksînê tam lihember nexweşiyê têne parastin.

Heta piştî vaksîne kirinê jî divê hûn jî rêbernameyên pêşîgirtina li belavbûna nexweşiyê bişopînin.




## Ev vaksîn çawa dixebite?

Ev vaksîne leşî hîn dike ku çawa vîrûsa korona peyda bike û li hember bisekine.

Naveroka vaksînê zû ji laş tê derxistin.

Helbet, laş hîn dibe ka çawa bi vîrusê re berxwedanê bike.




## Bandorên kêlekî

Ev vaksîn di projeyên lêkolînê yên berfireh de ku beşdariya hezaran kesan pêk hatiye, hatiye ceribandin. Bandorên kêlekî yên hevpar pêk tên ji:

- Êşa li cîhê derziyê
- Mandîbûna
- Serêş
- Êşa Laşî
- Tay û lerz

Ev bandorên kêlekî ne xweş in lê piştî çend rojan namînin.



## Bandorên kêlekiyê nehevpar

Eger piştî vaxslêdanê tûşî nîşanên neçaverêkirî, giran, an domdar bibin bi doktor an pisporê bijîşkiyên din re têkiliyê daynin.